Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 478 31- Cotmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# ÇIYAYÊ CÛDÎ: Çavkaniya destan û pirtûkên pîroz

**Çiyayê Cûdî li Kurdistanê xwedî cihekî girîng e. Weke sembola herêma Botanê ye. Di aliyê dîrokî de jî xwedî wateyeke mezin e. Cûdî ji ber wate û girîngiya xwe buye mijara gelek destan û pirtûkan. Îro jî vê girîngiya xwe weke navenda Têkoşîna Azadiya Kurdistanê didomîne. Cûdî îro jî yek ji navendên sereke yên Gêrîla ye.**





Çiyayê Cûdî ku bîrdariya rûmetê ya Mezra Botan e, bû mijara gelek çîrokan. Mirovan berê li Çiyayê Cûdî li gihayê



nemiriyê digeriyan, niha jî li azadiyê digerin.

Dema ku mirov qala Botanê dike, yek ji deverên ku tê bîra mirovan Çiyayê Cûdî ye. Ev çiya her demsalê xwe bi rengekî cuda dixemilîne. Mîna bîrdariya rûmetê ya Cizîr, Şirnex, Silopiya û temamiya Mezra Botan he rli ser piyan e. Vî çiyayê asî û bi heybet di nava metnên dîrokî û pîroz de jî timî cih girtiye.

Kesên hatine çiyayê Cûdî, çîrokên Lawkê Xerîb û Sefîne bihîstine. Ev çîrok digihêje heta dema sumeran. Dibe ku ji wir derbasî nava Tewratê, ji Tewratê jî derbasî nava Quranê bûye. Li gel versiyonên cuda yên vê çîrokê jî, qala hin bûyerên sedema destpêkê ya mirovahiyê dike ku ders jê tê derxistin.

### GOTINA SEFÎNE DI ZIMANÊN SEMÎTÎK DE, KEŞTÎ YE

Werin em bi hev re guh bidin çîroka Sefîne û ya defteke ku gerîla di navbera salên 2013 û 2015'an da danîne vê herêmê.

Wateya hevpar a gotina Sefîne di zimanên Semîtîk de, keştî ye. Ev keştî çawa û kengî hatiye vê derê? Gelo ev keştî bi rastî jî dibe ku keştiya Nûh be? Gelê herêmê û Koçeran ji me re qala çîrokên Sefîne û Lawkê Xerîb kirin. Me jî hewl dan di mîtên Sumer de şopên vê çîrokê bibînin.

Li gorî efsaneyê, Qralê Ûrûkê Gilgameş berê ji aliyê tebaa xwe ve gelekî dihate hezkirin. Lê belê quretiya wî ya piştre dikir, kir ku qîmetê Gilgameş li nava gel kêm bibe. Êdî jê nedihat hezkirin û bûbû rêveberekî mirovan êdî îdare nedikir. Gelê Ûrûkê ku ji quretî û daxwaza desthilatdariyê ya Gilgameş gelekî aciz bû, giliyê wî li cem xwedayekî din li cem Anû dike. Li gorî efsaneyê, Xweda Anû li gorî gilî û gazinên gelê Ûrûkê radibe Endîko yê hov û xurt diafirîne ku karibe Gilgameş pê mijûl bike.

### GILGAMEŞ LI DIJÎ HÛNBABA BI SER DIKEVE

Endîko ku li qada çiyayî dimîne, xerîbê jiyana li bajêr û şaristaniyê ye. Endîko bi fermana Gilgameş tê Qesrê û li vir tê perwerdekirin. Bi demê re Gilgameş û Endîko dibin dostên hev ên xurt. Biryarê didin ku rojekê bi hev re biçin seydê. Devera ku diçin jî erdnîgariya Bakurê Mezopotamyayê ye ku bi daristanên xwe navdar e.

Li vê derê hûtekî bi navê Hûnbaba heye ku daristanê diparêze. Gilgameş û dostê wî Endîko xefikekê datînin ber Hûnbaba û berê wî didin vê xefikê.

Hûnbaba yê dikeve xefikê bi Gilgameş re şerekî mezin dike û di encamê de winda dike. Bi vî rengî Gilgameş ê nûnerê şaristaniyê bi ser dikeve.

Endîko ku berê di nava heman şert û mercên Hûnbaba de dima, ji ber serketina Gilgameş kêfxweş dibe. Ji ber ku ew jî êdî mirovekî bajarî ye. Heval û dostê Gilgameş e û di heman demê de maskotê wî ye. Piştî ku Endîko dimire, Gilgameş hem xemgîn dibe hem jî ji tirs mirinê gelekî ditirse.

### NAVÊ NÎSÎRÊ DI QURANÊ DE WEKE CÛDÎ DERBAS DIBE

Ji wê rojê û pê ve dikeve nava lêgerîna nemiriye. Ev hewldanên wî, wî digihîne cem Ûtnapîştîm ku ji tofana mezin bi saxî rizgar bû û bi xwarina gihayê nemiriye, nemir bûye. Ûtnapîştîm ku piştre wê di Tewratê de weke Hz. Nûh bê binavkirin, ji Gilgameş re qala serpêhatiya xwe dike. Ûtnapîştîm dibêje ku keştiya wî ancax di roja heftan de li bejahiyê rûniştiye, dema ku sekinî, wî gihayê ku ji binê avê derket xwariye û bi vî rengî nemir bûye. Ji bo vê jî Çiyayê Nîsîrê weke navnîşan nîşan dide.

Cihê ku Ûtnapîştîm jê re Çiyayê Nîsîr dibêje, piştre di ayeta 44'an a Sûreya Hûtê ya Quranê de wiha tê vegotin: "Di dawiya dawî de erd av vexwar! Û ezman ava xwe rawestand. Avê xwe vekişand; karê xwe qedand. Keştiyê jî xwe li Çiyayê Cûdî danîn". Li gorî destanê, Gilgameş piştî rêwîtiya bi rojan, xwe gihand cihê ku Ûtnapîştîm jê re got û gihayê nemiriyê dî. Gilgameş hişyariya Ûtnapîştîm anî bîra xwe û giha yekser nexwar. Lê belê ji ber ku gelekî westiyabû yekser bi xew ve çû û wê kêliyê marekî ew giha xwar.



### DOH LI NEMIRIYÊ DIGERIYAN, ÎRO JÎ LI AZADIYÊ

Gilgameş piştî ewqas bûyerên bi serê wî ve hat, digihêje vê hişmendî û tecrûbeyê; tişta ku mirovan nemir dike, ew tiştên li pişt xwe hiştine! Cûdî di zimanê Arî d tê wateya 'cihê xwe dît'. Ev cihê keştiya nû, çima nebe cihê Gilgameş an jî bi gotineke din nebe cihê Lawikê Xerîb? Doh li vê xakê li gihayê nemiriyê digeriyan, îro jî li azadiyê... Mîna ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dibêje, 'Em di destpêka dîrokê de veşartî ne, dîrok jî di roja me ya îro de..."

Dewleta Tirk di vê serdemê de êrîşî erdnîgariya Kurdistanê, dîrok û nirxên manewî yên Kurdan dike. Bi vî rengî nîşan dide bê çiqasî barbar e. Dewleta Tirk ku dîroka xwe bi barbarî derbas bû, tirba Lawikê Xerîb û cihên ku gel ji bo xwe re weke mezre bi kar tîne, talan kir û nîşan da bê şerekî çawa yê qirêj dimeşîne.

Serokkomarê Tirk Tayyîp Erdogan her roj li qadan dike qareqar û dibêje ku wan li Cûdî kevir li ser kevir nehiştine. Erdogan ê ku bi salan e bi navê 'Îslamiyetê' siyasetê dike, mizgefa li Sefîneyê jî xera kir...*ANF*



Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 478 31- Cotmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## YPG'ê li Efrînê li dagirkeran xist



Çalakiyên şervanên YPG'ê li Efrînê li dijî leşker û çeteyên dagirker yên dewleta Tirk çalakiyên xwe didomîne. YPG bi çalakiyên bi bandor derbên giran li dagirkeran dixe. Navenda Ragihandinê ya YPG'ê daxuyaniyeke diyar kir, 27'ê Cotmehê li navçeya Raco ya Efrînê li dijî baregeheke leşkerên Tirk çalakiyek hatiye kirin û di çalakiyê de 2 leşkerên Tirk hatine kuştin.*R-2*

# TIRKIYE NAXWAZE ŞERÊ LI SÛRIYÊ BI DAWÎ BIBE

**Dewleta Tirk di 7 salên dawî yên şerê Sûriyê de xwedî roleke wêranker e. Rêjîma Tirk ku xwedî zêhniyeta Ixwanî û selefî ye bi piştgiriya komên çete yên weke DAIŞ'ê kir ku Sûriye wêran bibe. Bi taybet ji bo Bakurê Sûriyê nebe xwedî statu çi ji destan tê dike.**



### NIHA BERÊ XWE DAYE HERÊMÊN DIN

Dewleta Tirk li pêş çavên cîhanê beşeke axa Sûriyê dagir kiriye. Bi taybet bi piştgiriya dewletên weke Rûsyayê piştî ku Efrîn dagir kir niha hewl dide berê êrîşên xwe bide ser herêmên din yên Bakurê Sûriyê. Ji bo ku Kurd li Sûriyê nebin xwedî statuyekê bi her awayî tawîzan dide û bazaran dike. Dewleta Tirk her dema ku fersendê dibîne êrîşî herêmên Bakurê Sûriyê dike.


### DIVÊ LI BER ÊRÎŞKARIYA TIRKIYÊ RABIN

TEV-DEM'ê bi daxuyaniyekê êrîşa roja 28'ê mehê a artêşa Tirk a li dijî gundên Kobanê bi tundî şermezar kir. Di daxuyaniyê de işaret bi qonaxa dawî ya pêngava tinekirina DAÎŞ'ê hate kirin û hat diyar kirin ku dewleta Tirk hewl dide pêşî li qedandina şerê li Sûriyê bigire û tunekirina DAIŞ'ê bigire û naxwaze çareseriyeke demokratîk pêk were. TEV-DEM'ê bang li hêzên navnetewî kir ku li ber êrîşên Tirkiyê rabin. *R-4*

### GEFÊN ERDOGAN VALA NÎNE


Nivîskarê Rojnameya me Zekî Bedran jî di nivîsa xwe bal kişand li ser gef û êrîşên dewleta Tirk yên li ser Bakurê Sûriyê û wiha dibêje, "Tirkiye dema ku dibêje "bila li Sûriyê xwîn raweste, şer bi dawî bibe" Kurdan ji derveyî vê digire. Weke dewlet biryara dagirkirina van herêman girtine. Niha li fersendan digerin û rojan dihêjmêrin. Gefên Erdogan wisa bi armanca propagandayê nîne." *R-5*

## Rêveberiya Xweser wê nûnertiya hemû gelan bike



Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, wê di 1'ê Mijdarê de dest bi wezîferya xwe bike. Hevseroka Rêveberiya Xweser Bêrîvan Xalîd, diyar kir ku rêveberî wê li herêmê, di nava meclîs û rêveberiya xweser de koordîneyê ava bike û got: "Hemû gelê me wê di bin vê sîwanê de cih bigirin." *R-3*

## Divê hevdîtin bi Ocalan re dest pê bike



Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Buldan tecrîdkirina Rêber Ocalan û nirxand û diyar kir ku aloziya ku li Tirkiye û Rojhilatanavîn heye bi tecrîda li ser Ocalan ve girêdayîye û wiha got, "Ji bo alozî û serdema şer bi dawî bibe divê demildest tecrîda li Îmraliyê bê rakirin. Destpêkirina hevdîtina li gel Birêz Ocalan ji bo siberoja Tirkiyê girîng e." *R-4*

## Werin em bi hevre tecrîdê rakin




Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî li Cizîra Botan di civîna gel de axivî û got, " Birêz Ocalan hatiye tecrîdkirin. Madem em ji bo demokrasiyê têdikoşin, wê çaxê rakirina tecrîdê erka me ye. Ev tecrîd ne tenê tecrîda mutleq a li Îmraliyê ye. Dewamkirina tecrîdê tê wateya zilma li welatê me. Ev civak li vî welatî li aştiyê digere. Rêya aştiyê li Îmraliyê ye. Werin em bi hev re tecrîdê rakin." *R-4*

## Balafira ku 188 kes tê de bûn kete behrê

Li Endonezyayê, balafira ku 188 rêwî tê de bûn kete nava deryayê. Saziya Lêgerîn û Rizgarkirinê ya Neteweyî (BASARNAS) ragihand, balafira Rêyên Hewayî ya Lîon a bi tîpa Boeîng 737 MAX 8, gava ku ji paytext Cakartayê diçû bajarê Pangkal Pînang ê Girava Sûmatrayê, demeke kin piştî ku rabû kete xwarê. Wezareta Ragihandinê ya Endonezyayê diyar kir, di balafirê de 188 kes hebûn. *R-2*

## Pêngava Hecîn yek ji pêngavên herî giran e



Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê ev 50 roj e berdewam dike. Berdevka Pêngavê Lîlwa Ebdulah diyar kir ku Pêngava Hecînê yek ji pêngavên herî giran e û wiha got, "Pêşde çûna şervanên me didome. Heta DAÎŞ bi temamî li herêmê biqede wê operasyona bê navber dewam bike. *R-3*

## Çeteyan bi wesayîtên bombebarkîrî ve girêdidin û dişînin



Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê a bi navê Şerê Tunekirina Terorê di roja 50 de dewam dike. Çeteyên DAIŞ'ê li hember pêşdeçûna QSD'ê nikarin bisekinin û derbên giran dixwin. Eşkere bû ku DAIŞ ji bo çeteyên xwekuj ji êrîşa bombeyî venegerin bi wesayitên bombebarkirî ve tên girêdan û bi ser şervanên QSD'ê de dişînin. *R-5*

## Di bin hemû şertan de berxwedanê didomînin

Gelê Efrînê û şervanên xwe du mehan li dijî êrîşên dagirkeriyê li ber xwe dan. Welatiyên Efrînê ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê neçar man ku ji Efrînê derkevin. Bi sed hezaran welatiyên Efrînê ev 7 mehe li herêma Şehbayê li ber xwe didin. Welatiyan diyar kirin ku ew ê têkoşîn û berxwedana xwe berdewam bikin heta ku Efrînê rizgar bikin û vegerin malên xwe. *R-6*



## Ciwan xwe ji bo Kongreyê amade dikin

Kongreya Ciwanan a li ser asta Sûriyê wê di 9'ê Mijdarê de were li dar xistin. Yekîtiya Ciwanên Rojava (YCR) civînek bi amedebûna dehan ciwanên Kobanê, Sirrînê li navenda xwe ya li Kobanê li dar xist. Endamê rêveberiya YCR'ê Çiya Kobanê da zanîn ku armanca kongreyê avakirina yekîtiya ciwanên Sûriyê ye. *R-2*



## Li dijî pişavtinê platforma zimanê dayikê ava kirin



Nûnerên neh partiyên Kurd, ji bo pêşvebirina zimanê Kurdî, têkoşîna li dijî asîmîlasyonê, ji bo zimanê Kurdî bibe zimanê fermî û li dibistanan bê hînkirin, li Amedê li hev civiyan û platformek ava kirin. Piştî civînê Daxuyaniya çapemeniyê bi zaravayên Kurmancî û Kirmanckî yên Kurdî hate dayîn. Partiyan li dijî asîmîlasyonê banga têkoşîna hevpar kirin. *R-6*

## Gerîlla çalakî kir, 3 leşker hatin kuştin



Li bakurê Kurdistanê gerîlayên HPG'ê her roj li dijî artêşa Tirk a dagirker çalakiyan pêk tînin û derbên giran li wan dixin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla daxuyaniyek da û diyar kir, li Çelê ya bi ser Colemêrgê di encama çalakiya gerîla de 3 leşkerên Tirk hatine kuştin. *R-2*

# YPG'ê li Efrînê li dagirkeran xist



**Çalakiyên şervanên YPG'ê li Efrînê li dijî leşker û çeteyên dagirker yên dewleta Tirk çalakiyên xwe didomîne. YPG bi çalakiyên bi bandor derbên giran li dagirkeran dixe. Navenda Ragihandinê ya YPG'ê daxuyaniyeke diyar kir, 27'ê Cotmehê li navçeya Raco ya Efrînê li dijî baregeheke leşkerên Tirk çalakiyek hatiye kirin û di çalakiyê de 2 leşkerên Tirk hatine kuştin.**

YPG'ê diyar kir, 27'ê Cotmehê li navçeya Raco ya Efrînê li dijî baregeheke leşkerên Tirk çalakiyek hatiye kirin û di çalakiyê de 2 leşkerên Tirk hatine kuştin.
Navenda Ragihandinê ya YPG'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku çalakiyên hêzên wan ên Qonaxa Duyemîn a Berxwedana Serdemê ya li dijî çete û leşkerên artêşa Tirk a dagirker ên li Efrînê dewam dikin.
Li gorî daxuyaniyê, 27'ê Cotmehê li navçeya Raco ya Efrînê, yekîneyeke YPG'ê li dijî bargeheke leşkerî ya artêşa Tirk a dagirker çalakiyek lidar xist.
Bi çalakiyê re şer derket û di encamê de 2 leşkerên Tirk hatin kuştin.

## Gerîlla çalakî kir, 3 leşker hatin kuştin



HPG'ê diyar kir, li Çelê ya bi ser Colemêrgê di çalakiya gerîla de 3 leşkerên Tirk hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser mijarê daxuyaniyeke nivîskî weşand û ev agahî da:

**LI ÇELÊ 3 LEŞKER HATIN KUŞTIN**

"Hêzên me roja 28'ê Cotmehê saet 16:30'î li dijî artêşa TC a dagirker a li ser Girê Koordîne yê navçeya Çelê ya Colemêrgê çalakiyek kirin. Di çalakiyê de çepereke dijmin bi temamî hate rûxandin û 3 leşker hatin kuştin. Artêşa TC a dagirker piştî çalakiyê obus û hawan avêt herêmê.
Roja 28'ê Cotmehê saet 07:10'an balafirên şer ên artêşa TC a dagirker bombe li derdora rûbarê Xakurkê yê li herêma Xakurkê ya Herêmên Parastinê yên Medyayê barandin."

## 23 kes li Şirnexê hatin destgîrkirin



Li Şirnex û navçeyên wê, di serdegirtina malan de 23 kes hatin destgîrkirin.
Hêzên çekdar ên dewleta Tirk danê vê sibehê avêtin ser 28 malên li navend û navçeyên Şirnexê.
Di sergirtinan de 23 kes hatin destgîrkirin.
Li gorî agahiyan, hin kes ji ber parvekirina li hesabên medya civakî, hinek jî ji ber tevlîbûna xwe ya li merasîmên cenazeyan hatine destgîrkirin. Kesên hatin destgîrkirin birin midûriyetên emniyetê yên li navçeyan.
Hêzên çekdar ên dewleta Tirk li 5 kesên din digerin ku di serdegirtinê de li malê nedîtin.

## Balafira ku 188 kes tê de bûn kete behrê



Li Endonezyayê, balafira ku 188 rêwî tê de bûn kete nava deryayê. Saziya Lêgerîn û Rizgarkirinê ya Neteweyî (BASARNAS) ragihand, balafira Rêyên Hewayî ya Lîon a bi tîpa Boeîng 737 MAX 8, gava ku ji paytext Cakartayê diçû bajarê Pangkal Pînang ê Girava Sûmatrayê, demeke kin piştî ku rabû kete xwarê.
Balafira ku li gorî dema herêmê saet 06:20'an bi hewa ket, saet 06:33'an ji radarê winda bû. Hate gotin, tîmên lêgerîn û rizgarkirinê ber bi herêma ku balafir lê ketiye xwarê hatine şandin.
Wezareta Ragihandinê ya Endonezyayê jî diyar kir, di balafirê de 181 rêwî û 7 personel bi giştî 188 kes hebûn.
Enqazê balafirê hate dîtin.

## Ciwan xwe ji bo Kongreyê amade dikin



Yekîtiya Ciwanên Rojava (YCR) yê Kobanê amedekariyên beşdarbûna Kongreya Ciwanên Sûriyê dikin.
Yekîtiya Ciwanên Rojava (YCR) civîneke bi amedebûna dehan ciwanên Kobanê, Sirrînê li navenda xwe li dar xistin. Civîn bi armanca xwendina rêziknameya Tevgera Ciwanên Welatparêz ku wê di kongreya ciwanan a li ser asta Sûriyê de di 9'ê Mijdarê de were li dar xistin, were pêşkêşkirin. YCR civînên xwe hem li Navenda Kobanê hem jî li navçeyên wê li dar dixe.
Endamê rêveberiya YCR'ê Çiya Kobanê da zanîn ku armanca kongreyê avakirina yekîtiya ciwanên Sûriyê ye û got: "Em ê ciwanên xwe bi rêxsitn bikin da ku em bi hêza ciwana şoreşa xwe bi ser bixin. Loma jî girîngiya vê kongreyê zêde ye."
Piştre rêzikname bi zimanê Kurdî, Erebî hat xwendin û ciwanên amede pêşniyarên xwe kirin.

## Qirêjiya hewayê di salê de 600 hezar zarokan dikuje



Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) ragihand ku qirêjiya hewayê ya hundir û derve di salekê de dibe sedema mirina 600 hezar zarokên biniya 15 salî.
Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê bi sernavê "Qirêjiya hewayê û tenduristî' li Cenevreyê konferansa kûreyî pêk anî. Konferans roja Duşemê dest pê kir û heta roja Pêncşemê dewam kir.
WHO raporek weşand û ragihand ku hewaya qirêj gefeke mezin li tenduristiya 1,8 milyar zarokan dike, yên ku temenê wan biniya 15 salan e.
Li gorî WHO'yê 92 ji sediyê nifûsa cîhanê di hewaya qirêj dijî û ev jî dibe sedem ku di salekê de 7 milyon mirov bimirin.
Hate ragihandin ku di sala 2016'an de ji ber hewaya qirêj û enfeksiyonan 543 hezar zarokên di bin temenê 5 salî de, 52 hezar zarokên temenê wan di navbera 5 û 15 salî de mirine.

## Li Ewrûpayê çalakiyên ji bo azadiya Ocalan didomin

Ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li bajarê Goteborgê çalakiyek hate lidarxistin.
Li ser banga Navenda Civakî ya Kurd a Demokratîk a Goteborgê li bajêr ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çalakî hate lidarxistin.
Hevserokê Navenda Civakî ya Kurd a Demokratîk ê Goteborgê Abdullah Konya diyar kir ku dewleta Tirk bi tecrîda li ser Ocalan re zagonan bin pê dike û sûcê mirovayetiyê pêk tîne.



Konya bêdengiya welatên li rojava û Swêdê ya li hemberî tecrîdê rexne kir û ji Swêd û gelên Ewrûpayê xwest ku bila helwesta hikumetên xwe şermezar bikin. Konya bang li CPT'ê kir ku bila peywira xwe bi cih bîne û bila CPT biçe serdana Ocalan.
Di çalakiyê de sloganên 'Azadî ji Ocalan re, aştî ji Kurdistanê re', 'Bijî Serok Apo' hatin berzkirin.



# Berxwedanê li ser tabloyan dineqişînin

**Li Kampa Serdem a li Şehbayê nîgargehek hatiye vekirin. Şêwekar û wênexêzên Efrînê li Şehbayê wê di tabloyên xwe de rastiya berxwedana gelê Efrînê û şervanên wê rave bikin. Şêwekar û wênexêz Erdelan Ibrahîm derbarê armanca nîgargehê de axivî û diyar kir ku wênexêz dîmenên berxwedana Efrînê li ser tabloyan nîgar dikin.**



**Idrîs HENAN**

Hunermendên Efrînê yên ku mixabin weke jimar li Şehba kêm mane, ji bona ku wêneyên birûmet ên qonxa yekemîn a Berxwedana Serdemê bikin malê giştî û lehengiya gelê Efrînê li hemberî hovtirîn neyarên gelan vebêjin, niha dest bi porjeya nîgarkirina çîrokên lehengiya yekemîn qonaxa Berxwedana Serdemê kirine.
Şêwekar û wênexêzên Efrînê li Şehbayê wê di tabloyên xwe de rastiya berxwedana gelê Efrînê û şervanên wê rave bikin. Ji bona ku ev kar di demeke nêz de bê pêkanîn, niha li Kampa Serdem a li Şehbayê nîgargehek hatiye vekirin. di wê hola nîgarkirinê de wênexêz dîmenên berxwedana Efrînê li ser tabloyan nîgar dikin.

### BERXWEDANA ME DIDOME

Şêwekar û wênexêzê pispor Erdelan Ibrahîm ku Endamê têkîliyên Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê ye derbarê nîgargeha Kampa Serdem de ev agahiyên destpêkê bi rojnameya Ronahî re parve kir: çawa ku li Efrînê me li hemberî êrişên dagirkeriya dewleta Tirk li ber xwe da, îro li Şehba jî em cihê xwe bi xortî di duyemîn qonaxa Berxwedana Serdemê de digirin. Bi hemû hêza xwe em hewl didin kiryar, nêzakatiyên qirker û rûyê kirêt ên vê dagirkeriyê bi dunyayê re parve bikin.

### WÊ BIBIN BINYADA AZADIYÊ

Ibrahîm got: Gelê Efrînê tevî ku bi zorê koçber bûye, lê dest ji berxwedanê bernedaye. Hîna jî ji bo vegera mezin, di hemû aliyan de amadekariyên xwe dike. yek ji şêwe û rêbazên berxwedanê ku gelê Efrînê girtiye ser milê xwe, vegotina heqîqeta yekemîn qonaxa Berxwedana Serdemê û kifişkirina rûyê rasteqîn a dagirkeriya dewleta faşîst a Tirkiyê ye.
Ibrahîm di dirêjahiya nirxandina xwe de ev tişt got: Armanc ji vê projeyê belgekirina vê lehengiya gelê Kurd e. Li ser vî esasî proje amade bûye. em hêvî dikin tabloyên bên xêzkirin, ji dîrokê re bibin mal û waneyên lehengiyê ji gelên dîtir re bibin binyada azadiyê.

### 30 TABLO WÊ BÊN AMADEKIRIN

Ibrahîm derbarê jimara hunermendên di vê nîgargehê de dixebitin de bi xemgînî got: Mixabin weke wênexêzên pispor tenê ez û mamoste Henîf Hemo mane. Lê bi sekna hevalên xwe yên hunermend bi îradeya têkbirina dagirkeriyê em yek tenê jî bimînin, emê vê projeyê bi ser bixin. Ibrahîm destnîşan kir ku; proje amadekirina 30 tabloyan hedef dike. Wê her wênexêzek 15 amade bike.
Ibrahîm di nav gotinên xwe de behsa armanca projeyê vegot û ev tişt li axaftina xwe zêde kir: Wê tabloyên me bi riya pêşengehan bên pêşandan.
Destpêk wê li Şehba li Kampa Serdem be. Piştre em ê hewl bidin wêneyên berxwedana Efrînê bi riya pêşengehan li tevahî Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê bên pêşandan. Eger derfet çêbibe wê li pêşengehên navdewletî ên dunyayê jî bên pêşandan.

### ARMANC BEL GEKIRINA DAGIRKERIYÊ YE

Şêwekar û wênexêz Erdelan Ibrahîm di dawiya gotinên xwe de tekez kir ku tabloyên bên amadekirin wê rastiya dagirkeriya tirk û komkujiyên ku pêk aniye bi raya giştî re parve bikin û ev tişt li gotinên xwe zêde kir: komkujî, hedefgirtina sivîlan, xirakirin, talanî, koçberî, lehengiyên berxwedanê û sekna gelê Efrînê wê di van wêneyan de bên belgekirin. Ji xwe qonaxa piştî koçberiya bi zorê li Şehbayê tê belgekirin, lê em difikirin piştî vê projeyê bi awayekî sîstematîk û profesyonal duyemîn qonaxa Berxwedana Serdemê belge bikin.

# Keçên Rojê wê li Cenevreyê bê nîşandan

Fîlmê Les Fîlles du Soleîl (Keçên Rojê) ku li ser têkoşîna jinên Kurd hatiye amadekirin, wê li 24. Festîvala Fîlman a Cenevreyê ya Navneteweyî bê nîşandan.
24. Festîvala Fîlman a Cenevreyê ya Navneteweyî wê 2'ê Mijdarê dest pê bike. Zêdeyî 150 fîlmên li ser mijarên cuda wê li li festîvalê werin nîşandan. Festîval wê heta 10'ê Mijdarê bidome û fîlm û lîstîkvanên gelek fîlman wê derkevin pêşberî temaşevanan.
Yek ji fîlmên li festîvalê were nîşandan, fîlmê Les Fîlles du Soleîl (Keçên Rojê) ye ku ji aliyê derhênera Fransayî Eva Hûsson ve hatiye amadekirin û qala têkoşîna jinên Kurd a li Şengal û Rojava li dijî DAÎŞ'ê dike.
Keçên Rojê yekemcar di 71. Festîvala Fîlman a Cannesê de hatibû nîşandan. Tevî ku xelat wernegirt jî fîlm gelekî bal kişandibû.





### MIN XWEST BERXWEDANA JINÊN KURD NÎŞANÎ CÎHANÊ BIDIM

Eva Hûsson di dema Festîvala Fîlman a Cannesê de li civîneke çapemeniyê axivî bû û li ser fîlmê Keçên Rojê gotibû, "Revandina jinên Kurd ji aliyê DAÎŞ'ê ve, tevî vê dramê jî teslîmnebûna wan, berxwedan û têkoşîna wan a destanî gelekî bandor li min kir. Wan ti carî serî netewand, teslîm nebûn û têkoşîna wan a bêhampa ya li dijî zext û sîstema paşverû gelekî bandor li min kir. Daxwaza wan a ji bo têkoşînê mezin e. Berê xwe dane serketinê û zanin ku serketin bi vê yekê dibe. Lewma bi ser dikevin. Ji ber vê yekê bandorê li her kesî dikin. Bandor li min jî kirin. Bi rêya vî fîlmî min xwest hêz, daxwaz û berxwedana wan nîşanî cîhanê bidim."



## Çav li şanoyê digerin



**Hozan Seyîdxan**

Şano, xwe dîtin û ji nû ve naskirine. Di heman demê de şano hunera ruhê zindî yê gelan e û hunera pêşxistina civakê ye. Rastiya tîne ziman û riya civakê ronî dike.
Şano çalakiya liv û tevgera qerekterên di çîrok, serpêhatî û qewimandinan de diyar bû ne bi riya ramanê derbasî ser dikê dike. Şano ji hemû beşê hunerê sûd werdigire. Fikir û ramanê di çarçoveya li hevanînê li gorî rêgeza xwe ya xweser derbasî çalakiyê dike.
Tê gotin ku hunera şano yê ji destpêka dîroka mirovatiyê ve heye. Tê payîn ku hemû liv û tevgera mirovan hunera cureyên şano yê bû ye.
Li gorî çavkaniyên zanyaran yekem car cure yê şanoya tragêdiya û komêdya di sed sala 5'emîn û 4'êmîn de serdema xwe ya herî pêşketî de bû ye.
Ji wan serdema ta roja me, şanogeran bi riya şano yê mirovatî ji bûyerên dîrokî, civakî, netewî û siyasî agahdarkirine. Rê li pêşiya serkeftinan vekiriye.
Berê li gelek welatan şano ya li kolanan dihate lîstin, girseyên gel ji ber bandora wê li dijî bindestiyê, zordariyê, dagirkeriyê radikire serhildanê. Di vê sed sala dawî de modernîte ya kapîtalîst pêşdaxistina çand û teknîka îndistruyalîzmê re bandor li hunera şano yê kir. Vê çandê hişt ku hunermendên şanoyê muhtacî populîzmê û diravan bibe.
Êdî şano li gorî daxwazên hin derdoran bi mijarên ne ji rêzê, tenê ji bo xîtabî ajoya wan bike tê bikaranîn.
Naveroka mijarên şano ya îro bûne mijarê çawa girseyan bidim kenandin, kêfa wan bînim, laqirdiyan bi wan bikim û hwd. Bi kurtî şano ji riknê xwe, rastiya xwe û exlaqê civakê hatiye dûr xistin.
Ev rastiya di kanalên tv yan de bas tê dîtin.Bi riya rêze filmên pembe pirsgirêkên civakan ji nedîtî ve dibînin.
Bi riya van rêze fîlman nirxê civakan dejenere dikin. Jinê wek obje bikartînin. Girseyên gel bi xewn û xeyalên sexte û rijî dixapînin.
Raste dîroka şanoyê di nav kurdan de hewqas dûr û dirêj nîne. Kurdan di dawiya sed sala bîstan de li derveyî welat bi riya şanogerên amator hin kurte skêç û şanoyan lîstin. Armanc û hewildana wan hunera şanoyê pêsbikeve bû. Bi taybet salên 80 de xebatên şanoyê bi amatorî be jî hate destpêkirin û heta salên 90'î bandorek mezin li girseyên gel dikir.
Dîsa di salên 90'î bi şûnde NÇM'ê li metrepolên Tirkiyê hunera şanoyê derbasî asta profesyonal kir û gelek şanoyên ji naverokê ve bi hêz afirandin.
Di van salande eleqeya ji şanogeriyê re pir bi pêş ket. Bi beşdarkirina bi dehan komê şanoyê re festîvalên şanoyê hatin çêkirin. Ji komê şanoyê re turneyan dihatin amadekirin.
Belê çi bû sedem û hişt ku ev xebata şano bê rawestandin. Li welat berê şoreşê berfereh û mezin bû, dem deman derfetê bi rêxistikirina xebatên hunerî hate bidestxistin, gelek saziyên çandê hatin sazkirin, başe kî an jî çi sedem ev derfetên zêrin ji dest hunermendan revand? Çima hunermendên şanoyê ji saziyên çandê û komeleyan bi dûr ketin?
Rêvebirên saziyan li gorî pîvan, rêgez û perwerdeyê erka xwe bi cih neanîn. Derfetê xebatên kolektîf ne afirandin. Ji xebatkarên hunerê re atolye yên hunerî saz nekirin. Li ser bingeha zanista hunerê derfetê perwerdeyê nehate dayîn.
Belê ev rewşên diyarkerin. Ji ber van egeran bi dehan hunermendên şanoyê ji sazî û dezgeyên me yên hunerî bi dûr ketin û hesîdin jiyana şanogeriya post modernîst. Ango dika şanoya biyanî ji wan re balkêş dihat. Hesidîn rêze filmên pembe, da bibin aktorek an jî fîguranek ji wan.
Eger îro şanoya kurd di asta herî jêr de be û xebatên şanoyê hatibe tevizandin, pêwiste rola sazî û rêvebirên saziyên me li ber çavan bê nirxandin.
Çawa şoreş û tekoşîn bê çand nabe, wisa jî çand an jî şoreş , an jî neteweyek demokratîk bê şano nabe. Napolyon, di derbarê şanoyê da wiha dibê je . Kî saziyek şano bide min, ezê artêşek ji leşkeran bidimê.
Ji ber ku hunera şano, di nava giştî hunera netewa demokratîk de stuna ronahîkirina civakê ye.

# Di bin hemû şertan de berxwedanê didomînin

**Gelê Efrînê û şervanên xwe du mehan li dijî êrîşên dagirkeriyê li ber xwe dan. Welatiyên Efrînê ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê neçar man ku ji Efrînê derkevin. Bi sed hezaran welatiyên Efrînê ev 7 mehe li herêma Şehbayê li ber xwe didin. Welatiyan diyar kirin ku ew ê têkoşîn û berxwedana xwe berdewam bikin heta ku Efrînê rizgar bikin û vegerin malên xwe.**

Welatiyên Efrînê yên ku ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk ji neçarî li Şehbayê dimînin, di bin hemû şert û zehmetiyan de berxwedana xwe didomînin.
Welatiyên Efrînê li hemberî êrîşên bi balafir û tankan 58 rojan li ber xwe dan, li ber germahiya havînê li ber xwe dan û niha jî xwe ji zivistanê re amade dikin. Welatiyan diyar kirin ku ew ê berxwedana xwe bidomînin.
Welatiyên Efrînê ku ev hevt mehe ji ber êrîşên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên li herêma Şehbayê bi cih bûne di qonaxa duyemîn a Bexwedana Serdemê de berxwedana xwe didomînin.
Tevî zehmetiyan jî zarokên Efrînê berê xwe didin dibistanên ku Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk li gundên Şehbayê vekirine. Her çi qas civaka



navdewletî û rêxistinên mirovî bûyer û binpêkirinên li Efrînê ji nedîve tên jî, lê dîsa jî ew dest ji têkoşîna xwe bernadin.
Têkildarî mijarê welatiyê bi navê Zekî Xilo yê li Kampa Serdem bi cih bûye wiha got: “Li Efrînê li hemberî balafirên dagirkeran me 58 rojan li ber xwe da. Ji bo parastina axa xwe gelek şehîd me dan û me mohra xwe li dîroka mirovahiyê da. Niha di nav van kampan de em berxwedana xwe didomînin û her çi qas şert û mercên jiyanê li vir dijwar bin jî, heta rizgarkirina Efrînê ji dagirkeran em ê li ber xwe bidin.”
Jina bi navê Qidret Betal li heman kampê bi cih bûye, destnîşan kir ku dagirkeran hewl da vîna wan bişikîne û wiha dewam kir, “Dagirkeriya Tirk bi êrîşên xwe yên hovane hewl da vîna gelê Efrînê bişikîne. Lê hemû welatiyan bi kal, jin û zarokên xwe berxwedaneke bêhempa nîşan dan û ji cîhanê re îsbat kirin ku ew xwediyên vîneke xurt in. Niha, di nav kampan û malên wêrankirî de me ji valahiyê jiyanek afirand.”
Di berdewama axaftina xwe de Qidret anî ziman ku welatiyên Efrînê, gelekî birêxistinkirî ne û got, “Piştî li Şehbayê bi cih bûn, xwe bi awayekî komînal bi rêxistin kirin. Em ji cîhanê re îsbat dikin ku Efrîn a me ye, ne ya dagirkerên faşîst e.”
Welatiyê bi navê Umer Hemo destnîşan kir ku ew berxwedana xwe de berdewam dikin da anîn ku şert û merc çiqas zehmet bin jî ew bi hêza ku ji şehîdan digirin têkoşîn û berxwedana xwe didomînin.…*ANHA*

# Parka Rêber Apo şahidê berxwedanê ye


Parka Rêber Apo ya taxa Şêxmeqsûdê ya ku ev 3 sale hatiye avakirin şahidê berxwedana taxê ye. Şêniyên taxê di parkê de odeyek ku tê de bîranînên şehîdan hene avakirine.
şervanên YPG/YPJ’ê ku hinek jê şehîd bûne, parka bi navê Parka Abdullah Ocalan di sala 2015’an de ava kir. Heta niha ev park bîranînên wan di nava xwe dihewîne û bûye şahidê berxwedana wan. Park veguheriye cihekî xwedî nirxekî manewî li gel şêniyên taxa Şêxmeqsûd a Helebê.
Park li El-Şiqeyif gundê Pino hatiye avakirin. Bi navê Parka Apo tê naskirin. Park di 4’ê Nîsanê de bi wesîleya Rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji aliyê şervanan ve hate vekirin.
Bi wesîleya rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi salan e dar lê tên çandin. Welatî navên şehîdên berxwedana taxê li darên ku diçînin dikin.
Wêneyên Rêber Ocalan, alên YPG/YPJ’ê û pankartên ku bi zimanên Erebî û Kurdî nivîs lê hatine nivîsandin hatine daliqandin.
Ji bo bîranîna şehîdên ku rol di avakirina parkê de lîstine, welatiyan odeyek di parkê de ji bo bîranîn û tiştên wan ên kesayetî wekî cil, wêne û lênûskên wan ava kirin.
Her wiha odayeke din wek pirtûkxane veqetandin. Di nav de pirtûk û parêznameyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi zimanên Erebî û Kurdî hene.
Têkildarî mijarê fermandarekî Yekîneyên Parastina Gel ê Helebê Kawa Bîlal wiha got: “Ji bo bîranîna hevalên xwe û ji ber



ku em bi fikr û felsefeya Rêber Ocalan ji bo avakirina civakeke demokratîk û azad ji bingeha Neteweya Demokratîk û biratiya gelan bawer in, me ev park ava kir.”
Kawa destnîşan kir ku park li cem welatiyên taxê û şervanan veguheriye cihekî xwedî nirxekî manewî…*ANHA*

# Li dijî bişavtinê platforma zimanê dayikê ava kirin

Neh partiyên Kurd li Amedê li hev civiyan û li dijî asîmîlasyonê ji bo teşwîqkirin û pêşvebirina zimanê dayikê platformek ava kirin.
Nûnerên neh partiyên Kurd, ji bo pêşvebirina Kurdî, têkoşîna li dijî asîmîlasyonê, ji bo zimanê Kurdî bibe zimanê fermî û li dibistanan bê hînkirin, li hev civiyan.
Partiyên ku daxuyaniya hevpar dan çapemeniyê wiha ne: Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), Partiya Herêman a Demokratîk (DBP), Partiya Azadî û Sosyalîzm (OSP), Partiya Demokrat a Kurdistanê-Bakur (PDK-B), Partiya Demokrat a Kurdistanê-Tirkiye (PDK-T), Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK), Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK), Partiya Azadî û Mirov û Tevgera Azadî.
Nûnerên her neh partiyan li navenda Civata Rojnamevanan a Başûrrojhilat daxuyaniya hevpar dan çapemeniyê.
Hevserokê DBP’ê yê bajêr Îbrahîm Çîçek, Hevseroka HDP’ê ya bajêr Fîlîz Bûlûttekîn, Alîkarê Serokê PDK-Tirkiyê Şerefhan Cizîrî, Serokê Giştî yê OSP Sînan Çîftyurek, Berdevkê Tevgera Azadî Ayetûllha Aşitî, Alîkarê Serokê Partiya Azadî û




Mirov Seda Dogan, Serokê Giştî yê PSK’ê Mesût Tek, Alîkarê Serokê Giştî yê PAK’ê Vahît Aba beşdarî civînê bûn. Daxuyaniya çapemeniyê bi zaravayên Kurmancî û Kirmanckî yên Kurdî hate xwendin.

### ASÎMÎLASYON KANSERA ZIMANE

Partiyan asîmîlasyon weke ‘kansera ziman’ bi navkirin û li dijî asîmîlasyonê banga têkoşîna hevpar kirin.
Di daxuyaniyê de ev tişt hatin gotin;
“Em neh rêxistin û partiyên ku navê wan li jêr hatiye nivisandin, ji bo zimanê dayika xwe ya ku hevbeş û berfireh e, li dijî asmilasyona ku bûye weke penceşêreke civakî, ji bo ku em bi hevre deng derxînin û dengê ku ji gelê me jî derkeve hîna bilindtir bikin, hatine cem hev. Em ‘Îro zimanê me, siberojê jî neteweya me wê têk biçe’, li miqabilî vê rastiyê re rû bi rû bûne ku xwîn jê diniqûte, ji bo ku em birînên xwe bikewînin, birînan bipêçin û bi hevdu re bersivekê bibînin, hatine cem hev. Bi saziyên siyasî û sivîl, bi rewşenbir û hunermandan, bi mellan, li dijberî asimilasyona zimanê Kurdî (Kurmancî, Zazakî) çareseriyên rojane û demdirej bibînin, hatine cem hev.

### LI MAL, KOLAN, OTOBUS, NEXWEŞXANEYÊ...

Em bi hişmendiya ku her gel bi ziman û çanda xwe heye tevdigerin. Em dixwazin ku miletê me li malan û kolanan, li mînîbus û otobusan, li nexweşxaneyan bi Kurdî (Kurmancî-Zazakî) biaxivin. Bi vê mebestê em dixwazin bangî gelê xwe bikin ku li zimanê xwe xwedî derkevin.
Em, ji bo ku siyaseta dewleta Tirk ku zimanê me xistiye ber sikratê teşhîr bikin, ji bo ku li dijî siyaseta yektîpkirinê, red û înkara li dijî Kurdan eşkere bikin, li ser sê beşên bingehîn em kar bikin, hatine cem hevdu.
Ji bo zimanê me yê ku dewlet dixwaze tune bike, bi saziyên pispor re, bi kesayetiyên Kurdan re, bi dînamîkên sivîl û siyasî re û bi gelê xwe re em dikarin çi bikin? Ji bo bersiva van pirsan em hatine cem hev.
Li Tirkiyeyê ji bo ku astengên li hemberî zimanê Kurdî ji holê rabin û ji dibistanê seretayî heta zanîngehan zimanê Kurdî bibe zimanê perwerdehiyê û li gel zimanê Tirkî di dora didûyan de bibe zimanê fermî û pejirandî, me biryara têkoşineke hevbeş daye.
Em li hemberî asîmîlasyona ku bûye weke penceşêreke civakî, dixwazin qîrîna gelê xwe bigîhînin raya giştî ya dinyayê û mirovên xwedî wijdan li Tirkiyeyê, dengê xwe bigihînin saziyên navdewletî weke Neteweyên Yekbûyî, UNESCO, Yekîtiya Ewropa, Konseya Ewropa û hwd. em ê ji bo mafê zimanê xwe alikariyê ji wana bixwazin.
Em, bi hemû van pêngavan ku wê bêne avêtin ji kadroyên sivil û siyasî û ya herî girîng jî ji gelê xwe dixwazin ku alîkariya bingeha çanda demokrasiyê û Tifaqa Neteweyî di nava Kurdan de bikin. Pengavên ku di vê mijarê de bên avêtin ne pêngavên dawiyê ne lê em dixwazin û hewl didin ku ev bibin pêngavên destpêkeke nû.”



## Waqayî Şerriye û Tecrîd

Medeni FERHO

Me, behsa 31’ê Adarê, waqayî şerriye kiribû, em dewam bikin.
Anatolya û Kurdistan, laboratuara tunekirina gelan e, arşîv e, lê nebûne pirtûk, bûne pirtûkxaneyên civakî. Ev pirtûkxane, hem çîrok û stran in, hem gorîstan û kavil in.
Mijara me ne têkiliya Îttîhadî û Xanedaniya Osmanî ye; rejîma darbeya gunehkar û têkiliyên îro ye. Di dîrokê de qevastin, mucîze nînin. Dîse jî hinek bûyer, weke “xerabûna rojê” ne, bandorê li dahatuya civakan dikin. Vaqayî şerriyê, 31ê Adarê yek ji van e. Ev serdema, di vîjdanê mirovan de cih girtina şûr e.
“Mabed”ek hate avakirin. Mabêda kînê û bi nijadperestiyê îşkdayî... Kîn, mirovên herî “behle”, belengaz, sist radikê ser piyan, tuj dike, wek “birîna mûmarî, ur’a xebîs e. Di pêvejoya avakirina komarê de, ev “mabed”, li qijleya yenîçerî û dibin serfermandariya Fevzî Çakmak de hate parastin... Enwer Paşa jî, li cîhana xeyalên “turan” bû.
Bêyî ku em dersa dîrokê bidin; em dewam bikin: Xanedaniyek, sîstemek têk diçû, di vê têkçûnê de du enî derketin pêş, Manastir û Selanîk... Elmanya eniya Selanîk, Igilîzan eniya Manastir destek dikirin
Bi desteka Elmanya eniya Selanîk serket û dergehê dojeha li pêşiya gelan hate vekirin. Îttîhadiyên Selanîk “Çeteyên Nêçîrvan” ava kirin. Ev jî, destpêka qirkirinan e û serdema kuştina kujerên wan ne diyar e!...
Komên Nêçîrvan, dibin navên “nigahbân-i hurriyet”, “muhâfiz-i meşrutiyet” şandin Stembolê û İsmail Mahir Paşa, rojnamevanên muxalif Ahmed Samimi û Hasan Fehmi Beg, dane kuştin. Kujer jî ne diyar bûn!...
Erdogan jî, çeteyên li Efrînê, wek “Kuwayî Milliye” bi nav kirin. Kuwayî Millîye, di qirkirina Ermenî, Suryanî-Keldani, Rum û Kurdan de kar kirin. Di serdema Kongreya Erziromê de, Kazim Karabekir jî, “Komên Gizîr” avakiribûn. Îttîhadiyan, ne tenê hişk-zuwa çete, ne şilf tazî şûr, medya meşrûkirina dehşetengîz kuştinan jî derxistin holê. Bi pêşengiya Derwîş Vahdeti, rojnameya “Volkan” derxistin û bi manşêtên “ol ji dest diçe”, “dixwazin dengê azanê ji mînareyan qut bikin” komên xelkê, ji bo felaketê rakirin ser piyan.
Her maşêta rojnameya Volkan, çarmixeke bû. Ev manşêt di qirkirina gelan de, li Antakya, li Kibrisê, îro jî, di qirkirina Kurdan de têne bikaranîn.
Em rastiyê, ji navbera hevokên dîroka Tirkan derdixin. Çeteyên Nêçîrvan, bi navê rêkûpêkiya çûne Stembolê, lê pêxwasî kirin, bûne sergerdeyên nava bajêr; talan, kuştin û revandin kirin. Piştre, çend sergerde û erserî dane pey xwe, êrîşî parlamento û parlamenteran kirin.Me ev dîmen, di destpêka avakirina Komara Tirkiyê de jî dît.
Çeteyên Sakkalli Nuredîn Paşa, ligel çeteTopal Osman, piştî komkujiyên li Derya Reş û Kurdistanê, li Enqerê êrîşî parlamenê kirin, parlamenter kuştin. Ev kiryar, şaristaniya Turk-î îslam e. Lewma, desthilatdariyên Tirk, ne pêr û doh, ne îro dikarin behsa xwe û azadiyê bikin. Tirk û azadî, tirk demokrasî û şaristanî ji hev dûr in... Nifşê ku dîroka bi bazar, dîroka bi qewêtî bidê nivîsandin, nikare rastiya dîrokê, rastiya cografya, rastiya gelan binivîse û qebûl bike.
Wek ku sucê van bextreşiyên dehşetengîz teva Birêz Ocalan û Kurd in, tecrîd kirin pratîkê û şerê qirkirinê dane dest pê kirin. Berî Ocalan jî, Îttîhadî ev bûn, îro jî ev teşlîh û tebak in. Tecrîd jî, newî qirkirin û “waqayî şerriye” ye!...
Desthilatdariya AKPê, mîratzadeyê Îttîhadiyan e û hiyerarşiya nîjadperestiya îşkdayî “mabeda kînê” ava kiriye.



# Pêngava Hecîn yek ji pêngavên herî giran e

**Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê ev 50 roj e berdewam dike. Berdevka Pêngavê Lîlwa Ebdulah diyar kir ku Pêngava Hecînê yek ji pêngavên herî giran e û wiha got, “Pêşde çûna şervanên me didome. Heta DAÎŞ bi temamî li herêmê biqede wê operasyona bê navber dewam bike.**

Berdevka Pêngavê Lîlwa Ebdulah operasyona li Dêra Zorê ya li dijî DAÎŞ’ê nirxand û diyar kir, pêngava Hecînê yek ji pêngavên herî giran e. Lîlwa Ebdulah destnîşan kir ku heta DAÎŞ biqede wê operasyona wan bê navber dewam bike.
Bajarokê Hecînê yê girêdayî Dêra Zorê herêma herî dawî ye ku çeteyên DAÎŞ’ê li bakur û rojhilatê Sûriyê dagir kiriye. Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ji bo rizgarkirina vî bajarokî ev 50 roj in operasyonê dikin. Berdevka Pêngavê Lîlwa Ebdulah li ser qonaxa dawî ya pêngavê axivî û diyar kir, ev herêm ji bo çeteyan stargeha dawî ye û diyar kir heta ku DAÎŞ li vê herêmê biqede wê operasyona xwe bê navber bidomînin.
Lîlwa Ebdulah bi bîr xist, operasyona Hecînê 11’ê Îlonê li çar eniyan dest pê kir û heta ku DAÎŞ bi temamî ji herêmê bê avêtin wê dewam bike. Lîlwa Ebdulah got, “Pêngava Dêra Zorê meha Îlonê dest pê kir. Armanc ji pêngavê ew e ku rojhilatê Firatê bi temamî ji DAÎŞ’ê were paqijkirin. Pêngavê ji çar baskan dest pê kir. Armanc ji vê yekê ew e ku herêmên Hecîn, Sûsa, Şefa, Ebû Xaser û Ebû Hesen ji çeteyan bên paqijkirin. Heta ku herêm bi temamî ji çeteyan bê paqijkirin wê pêngav dewam bike.”
Ebdulah diyar kir, rojên dawî ji ber bahoza ji tozê şerekî giran diqewime û wiha dewam kir: “Em di rojên herî giran ê şer de ne. Li gelek deveran şerekî dijwar diqewime. Di vî şerî de hin şervanên me şehîd bûn, hinek jî birîndar bûn.”
Ebdulah anî ziman, di şerê sê rojên dawî de herî kêm 80 çete hatin kuştin, gelek wesayitên zirxî yên çeteyan û wesayitên bombebarkirî hatin rûxandin. Ebdulah bi dewamî got, “Bahoza ji tozê bandoreke neyînî li pêngavê kir, lê belê pêngav dewam dike. Ev êrîş ji ber bahoza ji tozê tên kirin. Şervanên me jî bi lehengiyeke mezin rabûn û êrîş têk birin. Bi rêya mayin û wesayitên bombebarkirî hewl didin pêşî li pêşveçûna me bigrin. Beriya niha jî li herêmên din ev rêbaz bi kar anîn.”



### YEK JI PÊNGAVÊN HERÎ GIRAN E

Lîlwa Ebdulah ragihand, hêzên koalîsyonê jî bombeyan li çeperên çeteyan dibarînin û destnîşan kir, ev pêngav yek ji pêngavên herî giran e. Ebdulah got, “Yek ji pêngavên herî giran e. Ji ber ku ev der rawestgeha dawî ya çeteyan. Lê belê di nava 50 rojî de şervanên me her bi pêş ve çûn.”
Berdevka Pêngavê Lîlwa Ebdulah diyar kir, piştî ku wan herêm ji çeteyan paqij kirin wê radestî îradeya sivîl bikin û got, “Çawa ku beriya niha li herêmên din, mesela li Reqa, Tebqa û Minbicê rêveberî ava bûn, wê ev der jî bi heman rengî be.”…*ANF*

# Li her deverê azadî û rastî bi ser dikeve

Melek DEMÎRTAŞ

Bi boneya 1.salvegera rizgarkirina bajarê Reqayê ji çeteyên DAIŞ`ê de Fermandara YPJ’ê Nûnhar Yilamz destnîşan kir ku di ser rizgarbûna bajêr re salek debas bû, ew ewrên tarî hilat û rojên azadiyê têne hûnandin dê rastî û îradeya azad bi ser ket.

### SALVEGERA AZADİYÊ YE

Fermandara YPJ’ê Nûbhar Yilamz destpêkê de1.salvegera rizgarkirina Reqayê li tevahî şervanên azadiyê ku di berwxedana rizgarkirinê de cih girtin û li gel pîroz dikir û wiha ser rol û misyona şervanan taybet jî YPJ’ê di rizgarkirina Reqayê de axivî: “Ev gelê ku niha azadiya xwe di salvegera rizgarkirina Herêma xwe bi coş û tevlîbûnek mezin pîroz dikin, di hemleya rizgarkirina Reqayê de di destên DAIŞ’ê bûbûn mertalê zindî. Ji bo wê jî ev hemû gelê Reqayê vê rojê mîna jinûve dayîkbûn dibînin û roja tarî ronîkirin bi nav dikin, wateya azadî jiyankirin naskirin.”

### Bİ TİLÎLÎ Û ÇEKÊN YPJ’Ê PEYTEXTA DAIŞ’Ê HİLWEŞÎ

Fermandar Nûbhar bal kişand ser girîngiya rizgarkirinê û wiha dom kir: “Rizgarkirina Reqayê bi hemû aliyan de girîngbû, her wiha ku beriya salekê wekî peytexta DAIŞ’ê dihate bi navkirin, lê ew bi berxwedaniya şervanan hate hilweşandin. Di heman demê de gelekî ku 3 salan di bin hişmendiya hov û tarî de ku di dorpêçek çi di milê îrada, çandî û felesefî de wekî zindanekî tarî de jiyan dikirin; ser daxwaziya gel pêwîstiya vê hemleya rizgarkirinê hebû. Taybet di her şerî de piranî zarok û jin yên herî zêde rastî îşkenceyan tên, her wiha bi armanca tolhildana jinên Êzdiyê Şingalê me jî wek jinên YPJ’yî rizgarkirina wan jinan ji xwe re wek peywir dît. Ji ber ku herî baş me êşa wan jinan fêm dikir, ser vê bingehê fermandarên YPJ’ê ev hemeya qordînkirin, derbaya herî mezin ku çeteyên DAIŞ’ê xwarin bi vîn û çekên YPJ’ê



ew peytexta wan hate hilweşandin û jiyanek rengîn bi têlîlî û rûkeniya şervanan rizgarbû, raste di oxira wê de jî şervan û fermandarên YPJ’ê şehîd bûn jî, lê her bedelê azaiyê girane.”

### NE BI TENÊ LI REQAYÊ, JINAN LI HER DERÊ PÊŞENGÎ KIR

Fermandara YPJ’ê Nûbhar Yilmaz bi bîr xist ku Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) pêşengiyeke xurt ji hemleya rizgarkirina bajarê Reqayê re kiriye û wiha got: “Di her rizgar kirina herêmk anjî bajarkî de gel di gotin me”Çima hun dereng man.” Ji bo wê jî her şervan bi armanca parastina sivîlan bi rihekî berpirsiyartî şer dikirin, raste hemleya Reqayê cenga mezin bû lê, cenga mezin ku gel niha bi wê coşê salvegera xwe bi moral û îrade pîroz dike. Her wiha wê YPJ’ê vê rola xwe ya pêşengiyê li Dêrzaorê li hemberî çeteyan dilîzin.”
Fermandara YPJ’Ê Nûbhar Yilmaz destnîşan kir jinên ku 5 hezar sal e têne kolekirin û careke din tama azadiyê kirin û serî hildan, DAIŞ’ê hewl dida wan dîsa bike kole, ji bo wê jî. Û wiha bi dawî kir: “Ne tenê li Reqayê, ji Minbicê heta Dêrazorê em bi heman rolê rabûn û vê erka xwe didomînin. Ev yek encameke yekitiya jinan a li dijî DAIŞ’ê ye. Aliyekî girîng jî ew bû ku jinên Ereb tev li wê pêngavê bûn. Li Tebqa, Reqa û Minbicê jinên Ereb bi awayekî çalak tev li têkoşînê bûn û şehîd dan. Ev jî ji bo me jinan serkeftineke mezin û destkeftiyeke girîng e.”

# Rêveberiya Xweser wê nûnertiya hemû gelan bike



Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, wê di 1’ê Mijdarê de dest bi peywira xwe bike. Hevseroka Rêveberiyê Bêrîvan Xalîd, diyar kir ku rêveberî wê li herêmê, di nava meclîs û rêveberiya xweser de koordîneyê ava bikin û got: “Hemû gelê me wê di bin vê sîwanê de cih bigirin.
Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku berî demekê hat avakirin wê di 1’ê Mijdarê de dest bi peywira xwe bike. Koordînasyona di nava meclîs û rêveberiya xweser de hat avakirin, wê di bin sîwana rêveberiyên kontonên Cizîr, Kobanê, Girê Spî, Efrîn û bajarên Reqqa, Dêrazor, Mînbîc û Tebqa de cih bigire.
Hevseroka Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bêrîvan Xalid, derbarê hemû kar û binesaziya herêmê ya bikin de axivî û diyar kir ku di Konferansa 3’yemîn a Meclîsa Sûriya Demokratîk (MSD) de biryar hat dayîn ku Rêveberiya Xweseriya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê avakirin. Xalîd, anî ziman ku rêveberiya wan xwedî peywireke sîwanê ye û wiha got: “Ger mijarek cuda dernekeve emê di 1’ê Mijdarê de dest bi xebatên peywira xwe bikin. Bi vê re em armanc dikin ku danûstandina di navbera herêman de pêş bixin, koordînasyonê ava bikin û hîn zêdetir ji gel re xizmet bikin. Biryara rêveberiya xweser û meclîsên herêmê, di saya serkeftinên şer ên li herêmê hatin bidest xistin, derket holê. Piştî pevçûn û şer, rêveberiyek sîwan hat avakirin. Ji bo ku em bi hevre tevbigerin em rêveberiyek wiha ava kir. Hemû gelên me cihê xwe dinava vê sîwanê de digirin. Ji hemû bajaran mirov cihê xwe tê de digirin. Em armanc dikin ku girîngiya xwe bidin ser karên îdarî, xizmet û sererastkirina qadan.”
Bêrîvanê da zanîn ku piştî ku wan rêveberî avakir, li hemû herêman geriyan û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Me hevdîtin bi hemû gel û rêveberiyên herêmê re pêk anî. Em dixwazin gelê herêmê hîn zêdetir ji bo avakirinê amade bikin. Di vê mijarê de bernameyek dem dirêj li pêşiya me heye. Emê bi vî awayî dest bi xebatên xwe bikin. Ji bo binesaziya herêmê, xebatên tenduristî û perwerdê, stargeh û hwd, emê li herêmê xebatên bi rêve bibin. Bi taybetî me ji bo avakirina herêmên ji DAIŞ’ê hatin rizgarkirin zend û bendên xwe ba dane. Ji bo paşve vegera mirovên me yên herêmê jî, me hemû derfetên xwe kirine dewrê.”…*MA*

# Bila hêzên navneteweyî li ber êrîşkariya Tirkiyê rabin

**TEV-DEM'ê bi daxuyaniyekê êrîşa roja 28'ê mehê a artêşa Tirk a li dijî gundên Kobanê bi tundî şermezar kir. Di daxuyaniyê de işaret bi qonaxa dawî ya pêngava tinekirina DAÎŞ'ê hate kirin û hat diyar kirin ku dewleta Tirk hewl dide pêşî li qedandina şerê li Sûriyê bigire û naxwaze çareseriyeke demokratîk pêk were.**

TEV-DEM'ê êrîşa roja 28'ê mehê a artêşa Tirk a li dijî gundên Kobanê bi tundî şermezar kir û diyar kir ku dewleta Tirk hewl dide pêşî li qedandina şerê li Sûriyê bigire û nehêle çareseriyeke demokratîk pêk were.
Navenda Têkiliyên Dîplomasiyê ya Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) derbarê êrîşa artêşa Tirk a dagirker de ya li dijî gundên Kobanê daxuyaniyek da.
Di daxuyaniyê de işaret bi qonaxa dawî ya pêngava tinekirina DAÎŞ'ê hate kirin û hate gotin, dewleta Tirk hewldanên ji bo qedandina şerê li Sûriyê û xebatên ji bo çareseriyê bi ti awayî qebûl nake.

### ÊRÎŞA DI DEMA CIVÎNA STENBOLÊ DE PÊK HAT

TEV-DEM'ê bi bîr xist ku êrîşa artêşa Tirk a li dijî gundên Kobanê di sibeha civîna çaralî ya li Stenbolê de pêk hat, ku lîderên Rûsya, Fransa, Elmanya û Tirkiye li hev civiyan.
Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku Tirkiye hîn jî dixwaze şerê li Sûriyê bidome û hate gotin, "Erdogan bi rêya têkşikandina derfetên çareseriyê hewl dide re ji aliyê siyasî û leşkerî ve Sûriyê hîn bêhtir ber bi rewşeke hilweşandî ve bibe. Tirkiye her wiha hewl dide pêşî li afirandina projeyeke demokratîk a ji bo çareseriya niştimanî ya Sûriyeyê bigire."
Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku li dijî vê êrîşa nerewa ya dewleta Tirk ku ti hincetên wê tune ne, rêveberiya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwedî mafekî temam ê xweparastinê û parastina projeya xwe ya demokratîk e di Sûriye û herêmê de.

### BANGA LI HÊZÊN NAVNETEWEYÎ



Navenda Têkiliyên Dîplomasiyê ya Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) êrîşa artêşa Tirk a lid ijî gund û deverên Kobanê bi tunî şermezar kir û ev bang lihêzên navneteweyî kir:
"Em banga lezgîn li hemû hêzên xwedî bandor di rewşa Sûriyê de û di serî de Neteweyên Yekbûyî, Konseya Ewlekariyê, Yekîtiya Ewropayê û Koalîsyona Hêzên Navneteweyî dikin; pêwîst e şer û serketinên li dijî DAIŞ'ê pêk hatine û hewldanên me ber bi çareseriyeke demokratîk ve binirxînin û ev rewşa pêşketin û serketina li dijî terorê li gorî tedbîrên taybet wernegirin. Nemaze hewldanên ku têkoşîn û şerê me li dijî terorê bixin qurbaniya berjewendiyên xwe. Her wiha ji erka van hêzan e ku çalakiya çareseriyê li Sûriyê bi xebat û kedeke cidî bi pêş ve bibin û çareseriyeke li gorî destûreke demokratîk ku daxwaza hemû welatiyên Sûriyê bi cih tîne, pêk bînin. Her wiha rê li pêşiya êrîşên Tirkiye û dagirkeriya wê li herêmên Sûriyê bigirin. Di heman demê de em bang li raya giştî ya navneteweyî dikin ku li gorî rastiya ku alîkariya Tirkiyê bi terorê re teqez dike û hewl dide aramiya li Sûriyê têk bibe, tev bigerin."
Di dawiya daxuyaniyê de bang li hemû gel û pêkhateyan, partiyên siyasî û tevgerên civakî û sivîl hate kirin ku helwesteke tund li dijî dijberiya Tirkiyê nîşan bidin.

# Werin em bi hevre tecrîdê rakin

Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî li Cizîra Botan di civîna gel de axivî û got, "Ev civak li aştiyê digere. Rêya aştiyê li Îmraliyê ye. Werin em bi hev re tecrîdê rakin."
Hevserokê Giştî yê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Sezaî Temellî tevî heyetek ji rêveber û parlamenteran hat serdana navçeya Cizîrê ya Şirnexê. Temellî tevlî civîneke gel bû ku li avahiya HDP'ê ya navçeyê pêk hat.
Temellî di destpêka axaftina xwe de Asya Yuksel û Mehmet Tûnç bi bîr anî û got, "Em ê ti carî ji vê rêyê venegerin. Ev rê rêya aştî, demokrasî û azadiyê ye."

### NAXWAZIN LI SÛRIYEYÊ ÇARESERÎ PÊK WERE'

Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî ragihand, serketina wan wê ne tenê li vê xakê, her wiha wê aştiyê bîne ji hemû gelên Rojhilata Navîn re û wiha dewam kir:
"Zîhniyeta ku li dijî me ye, zilmê li Rojhilata Navîn jî dike. Şerê Sûriyê encama vê ye. Me got, çareseriya li Sûriyê bi îradeya gelên Sûriyê dibe. Dema ku me got, 'Efrîn a Efrîniyan e' hinek rabûn em sûcdar kirin. Bila niha biçin li Efrînê binerin. Li wir talan heye, êşkence heye, jin tên firotin. Kî vê dikin, çete vê dikin. Bi piştgiriya ji bo çeteyan re Efrîn xistin vî halî ku Efrîn herêma herî aram û aştiyane ya Sûriyê bû. Niha qala Îdlibê dikin. Rewşa komên çekdar ne diyar e, ne diyar e ku wê dest ji çekan berdin an na. Van koman ewqasî sûc kirin, mirov ji cih û warê wan kirin. Ne diyar e bê li van were pirsîn an na. Ya ku tê kirin bazarî ye. Desthilatdariya li hemberî me Sûriye kiriye dojeh. Niha radibin li Stenbolê civîna bilind a çar alî dikin. Berê civîna bilind a sê alî kiribûn. Me got, 'çareserî ji wir dernakeve, ya ji wir derkeve kaos e'. Ji xwe wisa bû. Niha Îran ji dora maseyê rabûye, Fransa û Elmanya rûniştine.
Bi nedîtîhatina gelên Sûriyê re çareserî peyda nabe. Ya ku hûn ê bibînin neçareserî ye. Lê belê ev desthilatdarî xwe ji neçareseriyê xwedî dike. Lewma derdê xwe li Sûriyê ne çareserî ye."




### 'ÇARESERÎ BI GELÊN SÛRIYÊ DIBE

Temellî bal kişand ser gefên Erdogan ên li rojhilatê Firatê dixwe û got, "Hewl didin rojhilatê Firatê jî bixin nava xeleka ji êgir. Halbûkî li wir aştî heye. Gelên Sûriyê li rojhilatê Firatê di nava aştiyê de dijîn. Ji bo pêşî li çareseriya li Sûriyê bigire, timî rojhilatê Firatê weke hedef nîşan dide. Çareseriya li Sûriyê bi gelên Sûriyê dibe."

### TÊKOŞÎNA LI DIJÎ TECRÎDÊ

Temellî bal kişand li ser tecrîda li ser Rêber Ocalan jî û wiha got, "Birêz Ocalan hatiye tecrîdkirin. Madem em ji bo demokrasiyê têdikoşin, wê çaxê rakirina tecrîdê erk û berpirsyariya me ye. Ev tecrîd ne tenê tecrîda mutleq a li Îmraliyê ye. Dewamkirina tecrîdê tê wateya zilma li welatê me. Ev civak li vî welatî li aştiyê digere. Rêya aştiyê li Îmraliyê ye. Werin em bi hev re tecrîdê rakin."

# Divê hevdîtin bi Ocalan re dest pê bike



Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Buldan bal kişand ser tecrîdkirina Ocalan û got: "Ji bo krîz, alozî û serdema şer bi dawî bibe divê demildest tecrîda li Îmraliyê bê rakirin. Destpêkirina hevdîtina li gel Birêz Ocalan ji bo siberoja Tirkiyê girîng e."
Hevseroka Giştî ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Pervîn Buldan derbarê xebatên hilbijartina herêmî, îtîfaqa kurdan û tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de axivî.
Buldan anî ziman ku wê hilbijartina herêmî ji bo Tirkiyê û partiya wan bibe pêvajoyek girîng û got: "Em wek partî hemû amadekariyên xwe temam dikin. Komîsyonên me hatin damezrandin. Em li ser îtîfaqê û pêvajoya namzet diyarkirinê hevdîtinên berfireh pêk tînin. Heta çend hefteya wê ev hemû temam bibin û em ê stratejî û kampanya xwe ji raya giştî re eşkere bikin."
Buldan bal kişand ser kirinên qeyûman û wiha derbirî: "Divê em qeyûman ji şaredariya bi qewirînin. Ji bo me pirsgirêkek mezinin. Qeyûm tayînî 95 şaredariyên me kirin. Armanca me mezin e û divê ev armanca me nekeve bin 150 şaredariyan. Em bi hevparî û hevgirtinek yekîtîya demokrasiyê dikarin gelek şaredariyan ji destê AKP'ê derbixin. Di rojên pêş de em ê bi kî re îtîfaqan bikin wê diyar bibe."
Buldan bal kişand ser hevdîtina li gel partiyên Kurdistanî û got: "Em bi partiyên Kurdistanî re hevdîtinan dikin. Divê em tenê navê vê yekê nekin îtîfaqa hilbijartinê. Hevdîtinê me tenê ne li ser rojeva hilbijartinê ye. Em bixwazin nexwazin jî hilbijartin dibe mijara me. Lê armanca sereke yekîtî û hevgirtina kurdan e û sekna hevpar e. Em li ser van hemûyan gengeşeyên xwe pêk tînin. Ya ji bo me girîng ev e. Mesele tenê ne îtîfaqa hilbijartinê ye, meseleya herî girîng yekîtî û hevgirtina gelê kurd e."

### TECRÎD SÛCÊ MIROVAHIYÊ YE

Buldan, bal kişand ser tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û wiha dewam kir: "Tecrîd sûc mirovahiyê ye. Di warê siyasî û hiqûqî ev nayê qebûl kirin. Nêzî 20 salane tecrîdek girankirî li ser Birêz Ocalan heye. Divê tecrîd dimildest bê rakirin. Tecrîda li ser Birêz Ocalan, êrîşên li ser gelên Kurd û Tirk jî zêdetir dike. Pêvajoya heyî ya îro li Rojhilata Navîn û herêmê tê jiyîn, bi tecrîda li ser Ocalan ve girêdayî ye. Sê salên muzakereyê yên bi Ocalan re, salên herî xweş ên Tirkiyê bûn. Mirov bi hêvî bibûn û bi baweriyek mezin li wê serdemê mêze dikirin. Lê îro ji ber hin daxwazên vîna siyasî ev pêvajo ji holê hat rakirin. Bi vê yekê rê êdî Tirkiyeyê rojên xweş ne jiya. Serdema şer hat destpê kirin û mirov hatin kuştin. Wê demê di hevdîtinên me kirin de Birêz Ocalan digot 'Ger Tirkiye demokratîk bibe, wê tevahiya Rojhilata Navîn demokratîk bibe.' Lê ev pêvajo nehat temam kirin û bi dawî hat."
Buldan, di dawiya axaftina xwe de ev tişt got: "Ji bo krîz, kaos û şerê heyî dimildest bi dawî bibe, divê tecrîd bê rakirin. Bi rakirina tecrîdê re, divê hevdîtin bi Birêz Ocalan re bên destpêkirin, rêyên diyalogê bên vekirin û di derbarê pêşeroja Tirkiyê de biryar bên girtin. Desthilatdariya îro welat bi rêve dibe, nikare bi serê xwe biryar bide û ne di wê rewşê deye. Em baş dizanin ku di nava vê de hêzên navneteweyî hene. Lê dîsa jî Tirkiye di vî warî de dikare biryar bide û hêzên navneteweyî îqna bike. Em hêvîdarin pêvajoyek wiha bê destpêkirin."



# Çeteyan bi wesayîtên bombebarkîrî ve girêdidin û dişînin

**Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê a bi navê Şerê Tunekirina Terorê di roja 50 de dewam dike. Çeteyên DAIŞ'ê li hember pêşdeçûna QSD'ê nikarin bisekinin û derbên giran dixwin. Eşkere bû ku DAIŞ ji bo çeteyên xwekuj ji êrîşa bombeyî venegerin bi wesayitên bombebarkirî ve tên girêdan û bi ser şervanên QSD'ê de dişînin.**



Çeteyên DAÎŞ'ê ku ji ber operasyonên QSD'ê li Dêra Zorê asê mane, bi wesayitên bombebarkirî êrîşên xwekujî dibin ser şervanên QSD'ê. Eşkere bû ku ji bo çeteyên xwekuji ji êrîşa bombeyî venegerin bi wesayitên bombebarkirî ve tên girêdan.
Hecîn û gundên li derdora wê, li ser sînorê Iraq-Sûriyê herêma dawî ye ku çeteyên DAÎŞ'ê xwe lê girtine. Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ev 50 roj in operasyonê li vê herêmê didomînin.
Ji 11'ê Îlonê û vir ve gelek gundên herêma Dêra Zorê ji aliyê şervanên QSD'ê ve hatine rizgarkirin. Çeteyên DAÎŞ'ê van her du hefteyên dawî ji rabûna tozê sûdê werdigirin û li eniyên Hecîn û Baxozê gelek caran êrîş kirin. Çeteyên DAÎŞ'ê bi taybetî bi wesayitên bombebakirî êrîşê dikin. Pirraniya van êrîşan ji aliyê şervanan ve hatin şikandin. Yek ji deverên ku êrîş lê giran e, stasyona trênê ya li eniya Hecînê ye. Şervanên QSD'ê li vê derê wesayiteke bombebarkirî ya çeteyan rûxandin. Balkêş bû ku çeteyê xwekuj ê li hundirê wesayitê, bi wesayitê ve hatibû girêdan.
Di wêneyan de ku şervanan kişandine tê dîtin, milê çeteyê ku wesayit diajot bi wesayitê ve hatiye girêdan. Tê gotin, DAÎŞ ji bo nehêle ku kesên weke bombeyê zindî bi kar tînin bireve ev yek kiriye.
Beriya niha li ser êrîşkarên xwekuj ên DAÎŞ'ê, du sîstemên teqandina bombeyan hatibûn dîtin. Li gorî vê yekê eger kesê êrîş bike bombeyan neteqîne wê ji dûr ve bombe bê teqandin.
Ji şervanên QSD'ê Şervan Azad yên li eniya Hecînê li ser şerê giran ê sê rojên dawî got, çeteyan ji çar aliyan ve êrîş kirin, lê belê gelek kuştî dan û neçar man vekişin. Azad diyar kir, wesaiyeteke bombebarkirî ya çeteyan û wesayiteke leşkerî hatine rûxandin, bi dehan çete hatine kuştin û herêm di kontrola wan de ye…*ANF*

# Pirsgirêk bi avakirina civaka azad çareser dibin


**Ikbal BEDRAN**

Di bin diruşma "Pêşeroja Sûriyê di nav nesazîbûna cemseran û hevrikiya partiyan de" Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê roja 26 vê mehê li Kampa Serdem semînerek li dar xist.
Di semînerê de sê xalên ( Rola çalakiyên civakî, rola saziyên rewşenbîrî û rewşenbîran, danûstandina bi rejîmê re û Kurd û aloziyê yekbûnê) hatin nîqaşkirin.
Endamê dîwana semînerê Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê Usama Ehmed derbarê rola çalakiya civakî de ev tişt got: "Niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hişmendiya ku civakê esas digire li pêş e."
Ehmed derbarê rola rewşenbîriyê diyar kir ku di rastiya rewşenbîr de pêşengtî heye.
Di dirêjahiya semînerê de rewşa li Efrînê rûdaye bû mijareke encamgirtinê. Ji bo vê babetê Ehmed got: "Bi dagirkirina Efrînê re eşkere bû ku parçebûna siyasî civak jî parçe kiriye. Di bin tesîra wê de qismek mîna ENKS destê xwe xiste destê dagirkeran û bi çete û tirkan re Efrîn dagir kirin. Qismek din jiyana di bin siya dagirkeran de pê xweş kirin û ew kişandin Efrînê. Lê bi demê re ew bangeşeya ji dagirkeran re li stûyê wan geriya. Qismê mezin ê gel jî li Şehbayê cihê xwe di mewziyên berxwedanê de girtiye."



Girêdayî vê mijarê girîngiya yekîtiya neteweyî weke xaleke sereke derket pêş. Di vê derbarê de Ehmed got: "Mebest ji yekîtiyê, yekbûna belgeya siyasî, nerîn û projeyên neteweyî ye. Hemû hewldanên yekîtiyê têk çûne. Parçebûna siyasî bûye sersebebê parçebûna civakê."
Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê Usama Ehmed derbarê nerîn û nîqaşên di semînerê de pêş ketine de got: "Nîqaşên semînerê bi giranî analîz bûn. Weke encam derket; hemû kêşe dikarin di avakirina civaka azad de bên çareserkirin."
Ehmed wiha dewamkir: "Eger partiyên siyasî karîbana li Efrînê raya giştî avakiribana û li dora têkoşîna doza Kurd komkiribana, wê civak di aliyê helwest de parçe nebûya. Ehmed tekez kir ku êdî pêwîste mijarên han bi wêrekî bên nîqaşkirin. Ne rêveberî û ne jî partiyên siyasî xwe jê bidin alî. Lazime bi riya van semîneran em van qisûrên xwe derbas bikin."
Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê Usama Ehmed di dawiyê de tekez kir ku; Şoreşa Rojava hawûza hemû aliyan e. Ji ber berzbûna nirxên xwe, ji bo yekîtiya neteweyî xwedî insiyatîf e. Di rastiya xwe ya çareserker, guherîner û veguherîner de hemû cudatî û kêşeyan hembêz dike.

# Civîna Stenbolê û plana dagirkirina Sûriyê



**Zekî BEDRAN**

Almanya û Fransa jî beşdarî hevdîtinên li Tirkiyê ku li ser Sûriyê tên kirin, bûn. Berî niha Îran, Rûsya û Tirkiyê bi navê Astana hevdîtin dikirin û biryar digirtin. Niha Ewrûpa jî lê zêde kirin. Di vê rewşê de DYE dîsa li derve dimîne. Tirkiye di destpêkê de ji bo ku Kurdan li derve bihêle bi hemû hêza dixebitî. Ji ketina Sûriyê bigre serî li hemû rêyan da. Tirkiyê li Îdlibê bi awayekî eşkere nûnertiya komên çekdar kir. Ji bo ku komên çekdar tune bike bi Rûsyayê re ket nava hewldanên lihevkirinê. Xwest Ewrûpa û Emerîkayê jî tevlî vê bike. Rûsya li şûna şer, sûdê ji dijmintiya Tirk ya li Kurdan digre û hewl dide ku çeteyan bi destê wan bê bandor bike. DYE û Ewrûpa jî li dijî xurtbûna Rûsya û rêjîmê li Îdlibê xwedî derketin. Li dijî operasyona Rûsya û rêjîmê derketin.

Tirkiye di hevdîtina li Stenbolê de dibêje ku ji bo rawestandina şerê Sûriyê ew dixebitin. Erdogan vê yekê li pêş kamerayan dibêje. Qaşo ji bo ku gel zerarê nebîne ew dixebitin. Lê Erdogan rojek berê wê digot, "Em hişyariya dawî didin, bila Emerîka li Minbicê me mijûl neke, em ê bikevin Kobanê û Qamişloyê." Ev herêmên ku behsa wê dike jî erdên Sûriyê ne. Ev herêm bi ewle ne û bê pirsgirêk xwe bi rêve dibin. Efrîn jî di heman rewşê de bû. Bi ewle û aram bû. Lê Erdogan li pêş çavên cîhanê bi awayekî xedar êrîş kir. Rê li ber mirin û birîndarbûna hezaran kesî vekir. Bi sed hezaran mirov ji axa xwe hatin dûrxistin. Efrîn hê jî di bin dagirkeriyê de ye û paqijiya etnîkî lê tê kirin. Elmanya, Fransa û Emerîkayê li dagirkirinê temaşe kirin. Mîna ku xwedî li Îdlibê derketin xwedî li Efrînê derneketin. DYE'yê eşkere got ew têkilî Efrînê nabin û rê ji dagirkirinê re vekir.

Erdogan cesaret ji van polîtîkayên wan digire gefan li Kurdan û herêmên rojhilatê Firatê dixwe. Dibêje, çawa be jî kes li Kurdan xwedî dernakeve. Ger ne wiha buya ewqas êrîş nedikir. Dema ku Erdogan bi awayekî eşkere tehdît dikir dewletên mijara gotinê ti daxuyaniyek nedan û li ber ranebûn. Ji ber vê Tirkiye dixwaze Emerîkayê bêzar bike, zextê lê bike û rewşa dagirkirinê ava bike. Rûsya jî bi roleke gelek xirab radibe. Rûsya baş dizane ku Tirkiye li Îdlibê û herêmên din çeteyan bi çek dike û piştgiriyê dide wan. Niha jî dijmintiya Tirkiyê ya Kurdan sor dike û dixwaze qaşo wan û DYE'yê berde pêsîra hev. Ji aliyekî de jî Ereban sor dike, tu dibêje qey Kurdan DYE aniye Sûriyê. Rûsya li gel Îranê ji bo ku DYE'yê ji Sûriyê derxînin El Nûsra jî di navê de çeteyên çekdar û Tirkiyê dajo li ser rojhilatê Firatê. Rûsya eşkere propagandayên reşkekirinê û derewan dike û dibêje "Emerîka dixwaze Sûriyê parçe bike û dewleteke Kurd ava bike" dike. Herî baş Rûs dizanin ku daxwazeke Kurdan ya dewleteke cuda tune ye. Lewre Kurd ji destpêkê de bi Rûsan re di nava danûstandinê de bûn. Kurdan ti caran dewleteke cuda pêşniyar nekirin. Ji bo yekîtiya siyasî ya Sûriyê herdem destûreke bingehîn a demokratîk û çareserî pêşniyar kirin. Rûsan niha beşeke erdê Sûriyê bi Tirkan dan dagirkirin. Sûriye niha bi rengekî bi destên Rûsan hatiye dabeş kirin. Tirk li herêmên weke Efrîn, Bab û Cerablûsê bi cih bûne û xwe bi rêxistin dikin. A herî xirab jî Tirk bûne hevparê Sûriyê û ji bo pêşeroja Sûriyê bûne xwedî gotin. Herêmeke Sûriyê ya ji sedî 30 niha di bin kontrola Hêzên Sûriya Demokratîk de ye. Rûsya, Emerîka û Ewrûpayê ev hêza demokratîk a bingehîn ya Sûriyê heta niha beşdarî ti hevdîtineke navnetewî nekirine. Ev herêm ji derveyî hemû platforman hatiye hiştin. Sedema wê jî Tirkiye ye. Tirkiye nikare bi tena serê xwe qedera Sûriyê diyar bike. Ger ev dewletana hevgirtî tevbigerin Tirkiye zêde nikare bi pêşde here. Tirkiye ji wan cesaretê digire, gefan li Hêzên Bakurê Sûriyê dixwe û eşkere radigihîne ku wê dagir bike.

Tirkiye dema ku dibêje "bila li Sûriyê xwîn raweste, şer bi dawî bibe" Kurdan ji derveyî vê digire. Weke dewlet biryara dagirkirina van herêman girtine. Niha li fersendan digerin û rojan dihêjmêrin. Gelê Kurd divê li her devera cîhanê bikeve nava tevgerê, li hember van êrîşên nijadperest û dagirkeriyê divê gelan û hêzên demokrasiyê hişyar bike. Gefên Erdogan wisa bi armanca propagandayê nîne. Ji bo ku gelên herêmê û hêzên demokrasiyê bikevin nava tevgerê pêdivî bi xebateke lez heye.